ԽԱԼԸՏԵ ՋԱԼԻԼ, ԱԼԻԽԱՆԵ ՄԱՄԵ
XALITÊ CELÎL, ELÎXANÊ MEMÊ

# ՔՐԴԵՐԵՆ ԱՅԲԲԵՆԱՐԱՆ

# ELÎFBAYA KURDÎ




Երևան
«Սպիկա» հրատարակչություն
Yêrêvan
Weşanxana «Spîka»

Aa  agir

Bb  beq


Cc  cînar

Çç  çêlek


Dd  dar

Ee  ezman

Ê ê  rê


Ff  fîl


Gg  ga


Hh  hesp

Ii  bizin

Î î  dÎk

Jj  jijû

Kk  kurm

Ll  lepik


Mm  meymûn

Nn  nal

Oo  otax

Pp  pişîk


Qq  qijik

Rr  ro

Ss  se

Ş ş  şêr

Tt  têlefon

Uu  gund

Ûû  bûk

Vv  vizik

Ww  wardek

Xx  xanî

Yy 1 yek

Zz  zurne



ՀՏԴ 373.167.1 : 809.157 (075)
ԳՄԴ 81.2 Քրդ g 72
Խ 178

Խալըտե Ջալիլ, Ալիխանե Մամե
Խ 178 Այբբենարան. -
Եր.: «Սպիկա» 2020
Վերահրատարակում
XALITÊ CELÎL, ELÎXANÊ MEMÊ
ELÎFBAYA KURDÎ
Yêrevan, «Spîka», 2020

ՀՏԴ 373.167.1 : 809.157 (075)
ԳՄԴ 81.2 Քրդ g 72

© «Սպիկա» հրատարակչություն, 2018 թ.

ISBN 978-99941-898-1-6

# A a




A . . .



. a . a .



. . a



. a .



a ·



a .




A . a . a .




A *A* ____________________________________

a *a* ____________________________________

# N n



nan
an
a
na



| | | |
|---|---|---|
| a | nan | Anan |
| an | Anna | nan |
| | an | |







N 𝒩 ________________________________________

n 𝓃 ________________________________________

an na nan ________________________________________

Ev nan e.



6

# B b



b
ban
banan

ba-nan
banan

nan
an
a
na

| | |
|---|---|
| b | a |



B ℬ ______________________________

b 𝒷 ______________________________

ba, ban, banan ______________________

Ev ba ye.



# R r



baran
bar
ar

ba
bar
baran

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| b | a | r | a | n |

| | | |
|---|---|---|
| a | ba | bar |
| ba | bar | baran |

ba-ran
baran




berbaran




R *R* ____________________________________

r *r* ____________________________________


ar bar baran ______________________________

# R r







| | |
|---|---|
| r | · |



| | | | |
|---|---|---|---|
| b | r | · | · |

ra



| | |
|---|---|
| nar | nan |
| a | na |
| na | nan |

ra
bar
nar




R *R* ________________________________

r *r* ________________________________

ra, ran ________________________________

# E e



| e | r | e | b | e |
|---|---|---|---|---|

reben
ber



Nener e

| | | |
|---|---|---|
| e | er | ber |
| reb | ber | der |

ber ner
bar nar

ber beran

reben ber
ber bere



ber e




E E ____________________

e e ____________________

ber, beran ____________________

# S s



s
se
sebr
sera
sena

nas
bes
sar

| s | e |
|---|---|



| s | . | s | . | . |
|---|---|---|---|---|



| s | a | b | . | n |
|---|---|---|---|---|



S *S* ________________________________________

s *s* ________________________________________

sa, se, sebr ________________________________

11


# Ş ş




| ş | e |

| | |
|---|---|
| Ş | ş |
| şe | şeş |
| aş | şa |
| şa | şaş |

Şeş aş şeş-şeş



| ş | . | . |



| . | . | ş | . | . |



Ş *Ş*________________________________________

ş *ş*________________________________________

şe, aş, şa____________________________________

# O o




| r | o |

O
ro
bor
şor

be-roş
Re-şo
Şe-ro

şor-be
Şer-bo
E-şo

Ber + şo = berşo
-Başo, şera Baş reşe?






| . | o | n |




O *O* ________________________________________

o *o* ________________________________________

bor beroş ________________________________________

Berşo, bor

# K k



| | | |
|---|---|---|
| K | O-ko | Şa-ko |
| kar | ra-ke | Şek-ro |
| ker | ro-ke | şek-rok |
| kor | bar-ke | Ka-ro |

| k | a | r |

K
a o e
r

na-ke
nake



| k | e | . |



K 𝒦___________________________________________


k 𝓀___________________________________________

kar, kor, nake___________________________________

şekrok

14

# K k




| k | e | r |
|---|---|---|



kar
kor
ker
ka

berk
kar-bar
kar-ker

Be-ko
Şe-ko
Şa-ko

kar - ker
kor - kor
kar - kar

Beko karkere

k

a   o   e

r

Ka baran?
Ka ker?



Karka Keko koke




K 𝒦 ________________________________________

k 𝓀 ________________________________________

Kar, kor, ker ________________________________

berk, karker

# Ê ê



| | | | |
|---|---|---|---|
| bêr | bê | Baro | Re-şê |
| kêr | kê | şêro | Ba-şê |
| şêr | rê | kêra | Re-şo |
| kêr | şên | rêra | Ba-şo |

| ş | ê | r |

Barê kerê. Kêra ko. Şera Şerê.
Ke? ka?

e-rê
erê

bar + kêş → barkêş

rê-ber
rêber

kê-rek
kêrek



ba-bê
ka-kê
şe-şê
kar-kar
kêr-kêr



Ê *Ê* ________________________________________

ê *e* ________________________________________

Ker, kêr, Karê. ______________________________

Eva nîşana pirsêye ?

şêr, şêro

# D d



| d | e | r | d | a | n |
|---|---|---|---|---|---|

| | | |
|---|---|---|
| dar | derd | Dedo |
| dêr | erd | De-dê |
| der | ked | deb |
| dor | kod | dê |

de
dê
da
dar
der
dadan
derdan



ber-de
berde

a-dar
adar

- Dedo, rabe erdê rake!
- Narê ker berda.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Der-dor | ko | ka | kêr | ked |
| Dor-ber | kor | kar | dêr | bed |
| | kod | ka | dêr | deb |




D *D* ________________________________________________

d *d* ________________________________________________

Dar, Dedo, dod, kor ___________________________________

dêr, ked, deb

# V v



| | | | |
|---|---|---|---|
| dev | şev | de-ve | av |
| va | e-va | şe-ve | va |
| bav | e-vê | şo-ve | eva |
| şov | | vê | Bava |
| ev | | | |

| s | ê | v |
|---|---|---|

| | |
|---|---|
| ev | vê-evê |
| dev | va-eva |
| şev | van-evan |
| rev | |

ko-van
kovan

sê-vek
sêvek

aş-van
aşvan





V *V* ______________________________________________

v *v* ______________________________________________

Deve, eve, eva, vê, va ______________________________

dev, deve, şev

# L l



| b | i | l | b | i | l |
|---|---|---|---|---|---|


lêv dêl va-la
lê şêl be-la
lê-lê Lolê ko-le
kel kalê vo-kal



Kela avê. Ava kel.

Lo-lo alav
Lê-lê al
bilbil kal

kel - kol
kor - kor
kêl - kel




Lolê kar avda.
Lolê ker berda.
- Lolo Şêro, kerê barke!

lo-lo lal lod
lê-lê laş dêl
sol loş ol



L ℒ____________________________________________

l 𝓁____________________________________________

Lêlê kar avda ____________________________________

Ev nîşana bangdayînêye, baneşan e **!**

kêl, dêl,
şêl, vokal

19

# I i



| d | i | l | i | k |
|---|---|---|---|---|

inê
mil
şil
dil

Ki-no
Ki-nê
ba-ki-rin
ber-ki-rin

di-lik
ka-lik
sê-lik
şa-lik
be-nik


dil + şa = dilşa

bi-ra
bira

dikare rabe
nikare rabe

min
vir
dibin
didin
Dim-dim
kiras
movik
memik

sêl
mal
dil
şal
mil
→ ik



bide
bidin

bibe
bibin



I *I* ______________________________

i *i* ______________________________

kil, kil, şil, dil, inê, mil ____________________

kil, kil

# M m



| | | | |
|---|---|---|---|
| ma | mak | Me-mê | şem-dan |
| mer | kam | ma-se | me-rek |
| mêr | ka | Se-nem | mê-rek |
| mor | me | Si-mo | me-rek |
| maş | Şam | mak | ka-mek |

| m | a | l |
|---|---|---|

Me-mê
Memê

şem-dan
şemdan

Mala Memo

Mala Memo li ber aşe.
Mala Memo şêne.
Memê me aşvane.

Mal + ava = malava.
Rê + ber = rêber.



Mal-mal.
Malbav, malkir, mam, mend.

Keremke! Bimbarekbe! Erê! Keremke!



M *M*_____________________________________

m *m*_____________________________________

Mala Memo şêne ______________________________

Eva xal e •

kam, Şam,
maş, mor

# T t




| | | |
|---|---|---|
| tê | mam | te-nik |
| te | met | to-lik |
| ta | ket | tol-me |
| to | tel | ta-mar |
| | | sert |
| | | kert |
| | | merd |

| d | i | b | i | s | t | a | n |
|---|---|---|---|---|---|---|---|

Derket = der + ket.
Rêket, daket.
Tosinê dilovan

tav
tirs
tirş
tişt
sot
don
dot
bol

ket-ket
sot-dot
kot - kot
kit - kot
kite sol




têr
tim



T 𝒯 ____________________________________________


t 𝓉 ____________________________________________

Baran dibare. Av dikişe.______________________________

Eva nîşana wekhevîyê ye =

met, terk
ket, kit

# Û û



| | | |
|---|---|---|
| Û | kût | Rûken |
| rût | mûm | rûreş |
| sût | kûr | rûto |
| şûr | sûr | rûdan |
| dûr | bûm | tûnebûn |
| | | mûrmûrk |

| | | |
|---|---|---|
| ş | û | r |

bû
bûk
bûkek

re-bûn
rebûn


Dever = dev + e + r.
Rûspî, derketin.

bûn
rûn
dûr

dibin
dibên

dibe
dibû







Û *Û*______________________________________

û *û*______________________________________

bûn û nebûn ______________________________

Eva nîşana zêdekirinê ye +

# Î î



| | | |
|---|---|---|
| îman | şî-ret | şî-ret-kar |
| îro | bî-şî | bîr-a-nîn |
| mî | î-sal | rî-şî |
| sî | Mî-ro | dîn |
| bîst | nîr | dîn-dar. |

| m | î |
|---|---|

înî
sîr
tîr

Av + sîr = avsîr,
Sîr + e + mast =sîremast

a-nîn
anîn

A-lî
Ali

Sîr-sîrmî
tîr-tîremer
mîr-mîrtî



dîk
dîkek






Î *Î*___________________________________________

î *î*___________________________________________

dîk, îro, dîndar ___________________________________

Îman, bî, bîşî mîr, nîr, mast,
tîr, amede, amedekar.

# C c



| | | |
|---|---|---|
| C | cî-nar | c |
| cab | bi-rinc | ca-rî |
| cot | co-lang | ar-manc |
| cem | mir-can | kur-manc |
| birc | cûcik | ca-mêr |
| cerd | bocî | |

| c | e | r |
|---|---|---|


cî
can
cil
ceger

Comerd, cimcime, conî.

Cot-cot, car-car, cî-cî, cûre-cûre.

car-na
carna

ar-manc
armanc



Cemê cotek sol anî.
Cotê Celo kûr radike.

Cînarê mirov nebaş be dûr direve.



c *C*______________________________________________

c *c*______________________________________________

Conî, cêr, cûcik, colang______________________________

## Eva cixîze -

armanc, mircan,
colang, birc, cerd,
carî, comerd, camêr.

# Ç ç



| | | |
|---|---|---|
| çar | çar-çar | çe-tin |
| çîm | çî-men | çar-dar |
| çil | çil-çar | çi-nîn |
| dil | Dîl-ber | çan-di-nî |
| dîl | sîr-mî | çand |

| | | |
|---|---|---|
| ç | r | î |



çe-lek
çelek

ça-dir
çadir

çê-ki-rin
çêkirin

çi?
çima?
çend?

çi?
çima?
çend?

Çima çûn?
Çima çûn?





Ç *Ç*________________________________________

ç *ç*________________________________________

çîman û kanî __________________________________

dîl, çardar,çand.

# Y y



| | | | |
|---|---|---|---|
| yê | dinya | yek-şem | yar |
| yo | vaye | yek-şevî | yan |
| yek | kêye | Ley-lok | yek |
| teyr | neyar | Ley-lê | yêr |

| t | e | y | r |
|---|---|---|---|

yek + î + tî → yekîtî

yek + şev + î → yekşevî

yek-yek, yeko-yeko,

yek dar = darek
yek mil = milek



Ev ba ye.
Leylê li ber kon e.
- Ev kebab yê çiye?
- Yê beran e.

## Meselok:

Yek-yeke,
2 rindike,
3 komeke.



Y *Y* ______________________________

y *y* ______________________________

Ev ba ye ______________________________

## Eva bêhnûk e (vêrgul e) ,

yekşem, yekîtî,
yekbûn.

# G g



| | | | |
|---|---|---|---|
| ga | ge-mî | leg-leg | dor-ger |
| gav | ge-lî | govek | ga-kû-vî |
| gem | ga-van | bager | a-gir |
| goşt | go-lik | ger-den | şa-girt |


| G | e | n | i | m |
|---|---|---|---|---|

Da + gir + kir =dagirkir, dagirtin = da + girtin.

Germ -germe
şerm-şerme
nerm-nerme

ga gê gi

Ga — van, ran, mêş, kûvî



a-gir
agir

gi-rar
girar

gi-rîng
girîng



G G ____________________

g g ____________________

Grar teme ____________________

Genim yan garis ____________________

Gemî, govek, gakûvî,
dorger, gem, kem.

28

# U u




| | | |
|---|---|---|
| gul | gu-lî | Gu-lis-tan |
| dur | gul-çin | Gul-ba-ran |
| sur | sor-gul | dur-yan |
| kur | gu-man | gur |
| ulm | şu-ret | guneh |

| G | u | l |
|---|---|---|

ulmdar, durust, dudu, dudev, duserî.

Gul-Gulê
Dil-Dilê

Gundê kurda



gun-dî
gundî

kur-dî
kurdî

tu-ne
tune

## Meselok:

Gur û rûvî nabin bira.



U *U* ________________________________________

u *u* ________________________________________

gul û gulistan ______________________________

ulm, ulmdar,şuret.

# H h



| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| H | ha | meh | ha-vîn | hî-ve-ron |
| hîv | ho | deh | hê-şîn | he-val-tî |
| hov | hu | ceh | hê-lîn | çar-deh |
| hev | hi | neh | hov-tî | bîst-neh |
| hol | hê | har | hêrûn | yek-meh |
| hêk | hat | hûr | horî | havîn |
| | | | hênik | hebûn |

| h | î | v |
|---|---|---|

Hîv + e + ron = hîveron,




he-nik
henik

he-bûn
hebûn

hê-lîn
hêlîn

ha-vîn
havin

Hov, hol, rê, kîlomêtr.

## Meselok:

Hîv-hîve, bê eyb nabe.
Her gulek bînek lê tê.

| | |
|---|---|
| hêk | heb |
| hal | hevt |
| heyşt | hîm |



H 𝓗 ________________________________________

h 𝒽 ________________________________________

Hîveron, heb ________________________________

Eva nîşana parevekirinê ye :

# Z z



| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| zîn | zû | Zî-nê | ze-beş | zegerek |
| zîv | zar | Ze-rê | soz | ziman |
| ez | zêr | zi-nar | saz | hevraz |
| naz | zer | zarok | caz | nizar |
| baz | ze-vî | zîvan | zengil | Zagros |

| z | î | n |
|---|---|---|

Naz + dar = Nazdar. Gulî + zer = Gulîzer.
Sozdar, Gulîzar

Zêr — ker, bir, kir

Zor — ker, be, dest.

| ez-man | za-rok | zi-man |
|---|---|---|
| ezman | zarok | ziman |

Zozanê me blindin,
Va nêzîkî gundin,
Zozanê me şeşin
Kulîlk têda dimeşin.



Zor zane, zêr zane, zanîn zane.



Z *Z* ________________________________________________

z *z* ________________________________________________

Zinê û Zozan çûne zozana. ____________________________

baz, caz, nedîr, Sozdar, Nazdar.

# J j



| | |
|---|---|
| Jîr | jer |
| Jêr | ji |
| Jar | jî |
| Jor | jin |
| roj | jîn |

| | |
|---|---|
| a-rîk | ba-jar-van |
| ba-jar | bi-jar-tin |
| ber-jêr | ser-ber-jêr |
| ber-roj | dû-a-jo |
| ajan | girêj |
| heroj | jejerun |

| | | | |
|---|---|---|---|
| j | i | j | û |

Hêlîn ji bajarê Amedê ye.

ji
jin
jinik



ba-jar
bajar

di-bê-je
dibêje

ber-roj
berroj



J 𝒥 ____________________________________________

j 𝒿 ____________________________________________

Jijû, jîr, jar ____________________________________

şano,beroj.

# W w



| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| w | e | r | d | e | k |

| | | | |
|---|---|---|---|
| war | wer-dek | kewd | Ke-wê |
| wa | we-rîs | dew | we-zîr |
| wê | dew-let | xew | we-kîl |
| wir | da-wet | wêne | we-lat |
| wî | wêran | hew | Wan |
| | dawî | derewîn | |

Kaw-kubar. Kaw-kubar.
cî, war. cî-war.

## Werdek û rûvî

Carekê werdek di nav avêda hêsa dibûn. Rûviyek tele-tel hat ber avê, dît ku werdek di nav avêdane, nikare wana bigre, bi dengekî nazik got:
-Gelî werdeka, ji avê derên, werin vira, hela binihêrin vira çawa baş e, şînkayî davêje çokê, werin em tevayî bilîzin.
werdek hay ji delkê rûvî hebûn, lewma jî bersîva wî wiha dan:
-Tu were vira, wêderê ne baş e.

Yek ez, yê din hûn!
kin-dirêj
rast - . . . . .
biçûk - . . . . .
gelek - . . . . . .
blind - . . . .

dew-let
dewlet

we-lat
welat

### Meselok:

Welat ji şîrê diya mirov şîrintir e.



W *W*______________________________________

w *w* ______________________________________

Welat ______________________________________

werîs, wêne, warguhastin.


# X x





| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| x | e | z | a | l |

| | | | |
|---|---|---|---|
| xaz | ax | xe-lat | xalîçe |
| xar | xas | xiz-met | derxistin |
| xwîn | xak | tex-te | rêxistin |
| berx | xet | rext | xizmet |
| a-xîn | xem | xemgîn | daxistin |
| | | xurt | xwarbûn |

Mal + xal + an = malxalan.




Bi xêr hatî.
Xebera xweş xweş e,
Xebera nexweş kula reş e.

xer
xal

sax
xem



X 𝒳 ______________________________

x 𝓍 ______________________________

xarzî, birazî, zava, xezûr______________________

ax, xizmet,
rext, mamusta.

# Q q



| | | | |
|---|---|---|---|
| qar | qal | deqe | qeh-re-man |
| qer | qat | Qe-ro | qe-liş-tok |
| baq | qaz | şew-qe | qal-çî-çek |
| beq | qîl | qi-sîl | Qaqizman |
| deq | qe | qûjîn | quling |
| | | qêrîn | Qa-nat |

| Q | i | j | i | k |
|---|---|---|---|---|

te, be, re, de, he, le, çe — q

qa-sid
qasid

çi-qas
çiqas

qa — ş, z, s, r, l, m, n, t



## Têderxistinok

Xalê minî lingekî
Çû ber garana gundekî.
/ew çiye/




Q 𝒬 ____________________

q 𝓆 ____________________

qaz, deq ____________________

qar, qisîl, baz,
qas, qan

# P p



| | | |
|---|---|---|
| pola | Per-wer | pirtûk |
| pê | pê-sîr | pirpirîk |
| par | çar-pê | Pe-rî-şan |
| pîr | bê-par | pe-le-wan |
| por | pi-şo | pen-ce-re |
| pak | pîne | per-çe-bûn |
| post | poxîn | pel-pe-lî |

| p | i | ş | î | k |
|---|---|---|---|---|

dîn + perest → dînperest

agir + perest → agirperest

## CEJNA NEWROZÊ

21-ê adarê hemû kurd, li her derê cejna Newrozê pîroz dikin. Wê roja pir hêja agirê Newrozê yî pîroz tê vêxistin û sal bi sal wî agirî hê gur dikin.

Newroz cejna kurda ye netewiye. Newroz azadî ye. Newroz berxwedan e. Newroz cejna vejînê ye.



## Meselok:

Newroz e, ha Newroz e,
Newroze dew û doze.




P *P* ____________________________________________

p *p* ____________________________________________

Porsor, Perîşan, Pêşe ________________________________

cejin, pîroz, berxwedan, azadî, çarpê




| | | | |
|---|---|---|---|
| pîr | kurap | pûpû | çep |
| par | zerp | par-tî-zan | piling |
| pêr | pa-rî | paş-da- | pispor |
| paş | şop | mayî | payîz |
| ap | penîr | pêş-ke-tin | pêşmerge |
| pe-tin | pîvaz | | |



| p | î | v | o | n | g |

ber + o + paşo → beropaşo

Pîredê - diya pîr, pîrik
kaleşêr - ____________________
jinebî - ____________________
jinbav - ____________________

pîr + e + dê → pîredê

## Têderxistinok

Ser eyare, orte are,
binî dare?




P 𝒫 ______________________________________________

p 𝓅 ______________________________________________

pêr par ______________________________________________

pişmêr, şop, beropaşo, piştosan

# F f



| f | î | l |
|---|---|---|

| | | |
|---|---|---|
| fêl | fe-sal | efrîn |
| fen | mif-te | firîn |
| berf | Fe-rat | fir-to-ne |
| def | fin-deq | fer-man-dar |
| ref | fe-lek | fêl-ba-zî |
| kef | nefer | fi-lan-kes |
| qerf | fêlbaz | fer-man |

fey-de
feyde

fi-ro-tin
firotin

hef-tî
heftî

kêf-xweş
kêfxweş



## Fîl

Fîl di welatên germda dijîn.

Fîl gelekî aqil e. Ew pir zû hînî mirovan dibe, alîkariya mirovan, xebatê jî dike. Fîl giya, belg û çiqilê dara dixwe.

Fîl gelekî mezine, bilindiya wî digihîje sê mêtra, heftê-heştê salî dijî. Fîl piranî kom-kom digerin.



F ℱ ______________________________

f *f* ______________________________

Fesal, kef, fîl ______________________________

## Երկրորդ կիսամյակ
## NÎVSALYA DUDA

# Elîfba

Her gelek elîfbaya wî heye. Elîfbaya gelê kurd jî heye. Elîfbaya kurdî ji 31 tîpan pêk tê. Tîpên kurdî evin:

| | | | |
|---|---|---|---|
| A a | *A a* | N n | *N n* |
| B b | *B b* | O o | *O o* |
| C c | *C c* | P p | *P p* |
| Ç ç | *Ç ç* | Q q | *Q q* |
| D d | *D d* | R r | *R r* |
| E e | *E e* | S s | *S s* |
| Ê ê | *Ê ê* | Ş ş | *Ş ş* |
| F f | *F f* | T t | *T t* |
| G g | *G g* | U u | *U u* |
| H h | *H h* | Û û | *Û û* |
| I i | *I i* | V v | *V v* |
| Î î | *Î î* | Ww | *W w* |
| J j | *J j* | X x | *X x* |
| K k | *K k* | Y y | *Y y* |
| L l | *L l* | Z z | *Z z* |
| M m | *M m* | | |

Dûr bifikir, hûr bifikir, kûr bifikir...

# EZ PIRTÛKEKIM

Ez pirtûkekim. Bi wêneyên (şiklên) rengîn dagirtîme. Çîrokên pir xweş di nava minda hene. Min her demê paqij bigirin, ku ez hevalê we yî herdemîbim.

Gelo hûn dizanin ez ji ku hatime. Ew pirtûkên bi wêne û nivîsan dagirtî ji çi çêdibin? Berê ez dareke hêşîn bûm li daristan ê. Hinek mirovên ji saziya daristanê hatin, ez birîm, hûr kirim, ez birim karxana kaxez an. Ez di gelek karanînanra derbaz kirim. Ez destpêkê bûm hevîrê kaxezê; piştî wê bûm kaxeza ku hûn dibînin. Di pey wêra di çapxanê de li ser min nivîs hat lê kirin.

Bi vî awayî ez bûm pirtûk û gihîştim destê we.

# MALBETA ME






BAV DÊ KALIK PÎRIK XWÎŞK




ZAROK (KEÇ) ZAROK (KUR)







XAL JINXAL AP JINAP



*Spartin:*

Van nava hînbin.

# FÎQA MIN




Fîqa min deng şîrîne,
Tû-tû-tû-tû-tû
Miqamê xweş li hev tîne
Tû-tû-tû-tû-tû.

Fîqa min pir nazike
Dû-tû-tû-tû-tû
Ew me hemûya şa dike
dû-tû-tû-tû-tû.

Ez fîqa xwe hiz dikim,
Tû-tû-tû-tû-tû
Miqama ser rêz dikim,
Tû-tû-tû-tû-tû.

Têkst û mûzîk: Egîtê Cimo





*Spartin:*

Hînbin, bistrên.









Tu dûrî, dûrî,
Stêrk û nûrî,
Huba min kirî,
Biçûka min.

Bêy te betalim,
Melûl û lalim,
Qey bêjî kalim,
Şabûna min!



Nava şevêda,
Min navê te da,
Kesî cab neda
Şîrina min!

Tu niha dûrî,
Nav xewa kûrî,
De lûrî, lûrî
Ezîza min!



## Spartin:

Jiber bikin



Diya min wexta pêz
Didoşe,
Qurtek şîr dihêle
Gidêşa miyêda:
-Ew ji berxêra...

Diya min wexta dirûna
Genim
Simlê gênim dihêle
Nav pirêzada:
-Ew jî mûriyanra.



Diya min wexta komkirina
Tiriyan,
Gûşî dihêle
Di baxên hêşînda:
-Ew jî teyrara.

Diya min
Kêra bejî, parê derdixe
Ji keda xwe
Û xweyî dike vê dinya ronî
Bi rehma dilê xwe.






## *Pirs û spartin:*


1. Dayîk dema pez didoşe çi dike?
2. Dayîk bo çî wisa dike?
3. Çend gotina bêje derbarê dayîka dilovan da.

* * *

Çiya sipî bû,
Dayika min pêra,
Lê çiya dîsa
Kesk û sor kir,
Dayîk sipî ma.

Berfa pîrbûnê
Barî ser serî,
Kesereke kûr
Hesreteke dûr
Dilda qerimî.








*Pirs û spartin:*

1. Vê helbestê jiiber bike.
2. Porsipîûna dayîkê dişibe çi?
3. Dilê dayîkê de çi hisret ma?

Cînav

Ez
Tu
Ew

Em
Hûn
Ewana
Ewan




## HEVALÊ XIRAB

Du heval çûn daristanê nêçîrê bikin. Ji nişkave hirçek li pêşiya wan derket. Hevalek hilkişya serê darê, lê yê dinê veleziya, bîna xwe bern-eda, wekî hirç bizanibe, ku ew mirî ye. Hirç nêzîkî wî bû, bînkir û wexta texmîn kir, ku ew miriye, hişt û çû.

Wî çaxî hevalê wî ku rabûbû serê darê, peya bû, hat cem hevalê xwe, keniya, got:

-Hirçê di guhê te de çi got?

Hevalê wî got:

-Hirçê di guhê min da got, wekî careke din ez bi hevalê wekî tera neçim tu deran, wekî di wextê tengav da te tenê nehêle û nereve.




*Pirs:*

1. Du heval bi kuda çûbûn?
2. Hevalekî çi kir, yê din çi kir?
3. Hirçê di guhê hevalê dinde çi gotibû?

*Spartin:*

Çend rêza di lênûsa xwe da binivîsin.

# MAL, ODE, NAVMAL




## OTAXÊ MALÊ

Otaxa qîza
Otaxa hêsabûnê
Otaxa mêvana
Otaxa dê û bava
Otaxa zaroka
Serşû û destav









*Pirs û spartin:*

1. Bidin navê wana.
2. Ji wan nava hûn çi dikarin zêde bikin?

# FERAQ Û DERDAN



Çaydang



Baqê gula




Xwêdang

Kevçî
Kodik
Dîz
Kûp
Hesk
sîtil
Elek
Bêjîng
Destar
Sûsme
Kirdanek
Elb
Rûnhelk
Sirsûm



Tawe



Kêr




*Pirs û spartin:*

1. Bidin navê wana.
2. Ji wan nava hûn çi dikarin zêde bikin?

# NÎŞANÊN NAVA NIVÎSARÊDA TÊNE KARANÎNÊ

| | |
|---|---|
| Eva xal e | . |
| Eva cotxal e | : |
| Eva sêxal e | ... |
| Eva bêhnûk e | , |
| Eva cotneynûk e | << >> |
| Eva kevanok e | (  ) |
| Eva nîşana pirsê ye | ? |
| Eva nîşana bangdayînê ye baneşan e | ! |
| Eva cixîze | - |
| Eva nîşana wekheviyê ye | = |
| Eva nîşana zêdekirinê ye | + |
| Eva nîşana derxistinê ye | - |
| Eva nîşana lihevdanê ye | x |
| Eva nîşana parevekirnê ye | : |










Çay




Hoç




Şîr




Gulmast



Hêt



Penîr



Kodik



Sêtlî



Kevçî

# XWARIN Û VEXWARIN

Nan
Hêk
Goşt
Şîr
Mast
Firo
Toxavk
Sûtlî
Savar
Girar
Serbidew
Kiftê dan
Avsîr
Keledoş

TAŞTÊ:

Totik
Toxavk
Toraq
Rûnê nivîşk
Şîrînayî
Sûtlî

NANÊ NÎVRO

Goştê hêrayî tevî birinc
Şorba goşt
Girara tirşo
Girara silqa
Kiftê goşt
Salata pincarê
Nişa êmîş
Zebeş
Qawin

ŞÎV

Pincar
Êmîş
Şorba pincarê
Penîr
Nan
Kiftê birinc
Çay



## *Pirs û spartin:*

1. Çi dixwin?
2. Çi vedixwin?
3. Çi dixwin, çi wedixwin wexta taşte?
4. Çi dixwin, çi wedixwin wexta nanê nivro?
5. Çi dixwin, çi wedixwin wexta şîvê?

DIXWIN, ku têrbin.
VEDIXWIN, ku tîbûnê bişkênin

DIXWIN pê kevçî, şelbika kêrê, tasê

VEDIXWIN pê çaçika, kasa, fîncana.

DIXWIN: nan, hêk, penêr, toraq, hingiv, birinc, rişte, qoşm, pincar, êmîş...
VEDIXWIN: av, nişa, şerbet, şîr, dew, çay, kakao, qave...










*Pirs û spartin:*

1. Çima dixwin?
2. Çima vedixwin?
3. Pê çi dixwin?
4. Pê çi vedixwin?
5. Çi dixwin?
6. Çi vedixwin?

# HEBÊN NAN Û XILONGÊN BOSTANA



## NAVÊ NAN Û XÎLONGÊ BOSTANA

Genimê kirik
Genimê sor
Silq
Silqa sor

Kelem
Sîr
Pîvaz
Gizêr
Xiyar
Karî

Kundir
Garis
Îsot
Tivir

## HINAR

Ez hinarim, hinarim
Maleke giloverim,
Çend otaxê min hene,
Têda tijî zar mane,
Zarê min sorin, şîrînin,
Wekî jêkin, wê bigrîn.



*Spartin:*
Jiber bikin






*Pirs û spartin:*

1. Navê kîjan curê nana hatiye dayîn?
2. Navê kîjan xîlongên bostana hatine dayîn?
3. Ji wan nava hûn çi dikarin zêdebikin?

## NAN

Rast bixwînî, dîsa evim,
Çep bixwînî, dîsa evim,
Ser her sifreyî ez heme,
Kî dixwe, dibêje: - Çi tame.







### *Pirs û spartin:*


1 Jiber bikin
2. Ev di derberê çidaye?


## ÇAR SÊV

Min ji wera çar sêv anîn -
Sêvek para Nazê ye,
Sêvek para Qazê ye,
Sêvek para inê ye,
Sêvek ma, para kêye?











### *Pirs û spartin:*

1. Çend sêvê wî hebûn?
2. Wî sêv çawa parî hev kirin?

# SILQO

Wextekê mirovek hebû, navê wî Silqo bû. Ew mirov şevekê dereng tê mala xwe. Li dêrî dixe, jina wî tê ber dêrî û dibêje:

-Ew kiye?

Mêr dibêje:

- Ezim:

-Tu kiyî? Ez te nas nakim, ezê çawa derî li te vekim? Ew jî navê xwe ji bîr dike, nayê bîrê, difikire û dibêje:

-Navê min yê nav bostanan e.



Dibêje:


-Kelem?



Dibêje:

-Na!

Dibêje:




-Gizêr!

-Ha,-dibêje,-tu nêzîk bûyî.

Dibêje:

Tivir?

-Ha,-dibêje:



-Mal avayê, tu dûr ketî heyran, navê min torê nav bostan e.

Dibêje:

-Silqo?

-Ha- dibêje,-ezim ha.

Jina wî derî lê vedike.



## *Pirs û spartin:*

1. Navê mêrê jinikê çi bû?
2. Mêrik navê xwe çi kiribû?
3. Jinikê navê mêrik çawa anî bîrê?





1. Di şikilde çi fêkî /êmîş/ hatine nîşankirin?
2. Navê wana bêjin û cend nava di lênûsa xwe da binivisin.



EVA VÊNEYE



EVANA VÊNENE




EVA KASE



EVANA KASIN



EVA DESTE



EVANA DESTIN



EVA KUME



EVANA KUMIN

# HEYVANÊN MALÊ Û YÊN HOV




mirişk



beq



pişîka wanê



DIK




CUCIK



MEYMÛN



mesî



kera gund

Bixwînin û navê wan li bîra xwe da xweyîbikin.




Navê wana bêjin û çend nava lênûsa xwe da binivîsin.

## TEREVIL

Hirç
Fîl
Beq
Pişîk
Ker
Kevok
Piling
Şêr
Meymûn
Kûçik
Mesî
Cûcik
Mirîşk
Dîk
Varik
Çêlek
Gakûvî
Rûvî
Kêvrûşk
Mûrî
Beraz
Perpirîk
Bûm /kund/
Mar
Mişk

## CIVATA MIŞKA


Bû civata mişka. Mişka ji hevra gotin:

- Gelî mişkno, stara me di destê pişîkê da tune ye. Pişîk dizîkava tê me digre û dixwe, werin em zengilekî çêkin, bavêjin stuyê pişîkê, dema pişîk bê, wê dengê zengil bê û emê birevin, xwe xilas bikin.

Ji wana yekê got:

-De yekê jî bînin bila zengil bibe, bavêje stuyê pişîk ê.

Kesekî xwe neda ber zengil bibe, bavêje stuyê pişîk ê.





### *Pirs û spartin:*

1. Mişka çi biryar da?
2. Qira wana çima dihat?
3. Fikira we di vê pirsê da çiye?

Jijû çêjikê xwe tîmar dikir, digot:
-Ez qurbana pirtika teya hevrmûş bim.



## TEYRÊ WELATHEZ


Ji zargotinê

Nêçîrvanek rojekê diçe nêçîr ê. Kêleka çem rûdinê. Dîna xwe didê teyrekî nexşî bedew di nav avêdaye. Nêçîrvan teyr digre, tîne mal ê . Jêra qefeseke baş çêdike û çiqas tiştê baş hene ji bona xwarinê, dide ber. Teyr dîsa razî namîne, her dibêje:

-Ax welat, ax welat!

Nêçîrvan gelekî difikire dibeje, lê serva naçe, çima teyr çima wisa dibêje. Paşê ew teyr hiltîne, dîsa davêje wî cihî, ji ku anîbû. Wexta teyr dikeve nav avê dibêje:


-O, xweş welat, o, xweş welat!






### *Pirs û spartin:*

1. Teyr çima tengav dibû?
2. Welat ji bo teyr çibû?
3. Dema teyr berdan wî çi got?



Hem varik,
Hem cûcik,
Ava wan didimê,
Dan bi dan,
Qûtê wan didimê
Dan bi dan,
Ew hêk dikin
Ji dil û can.






*Spartin:*
Van zargotinan jiber bikin.

## GOTINOK

Çîrokê, çîvanokê,
Bezbezokê,
Xetxetokê,
Ez kuncî,
Ser dareke bilindcî,
Tu firiyî, ez mame cî.

Mêşê ser avêre banzda, got:
-Heft ritil bez ji nav dilê min heliya.
Got:-Tu çiyî, kaşa te çiye, wekî heft ritil
nav dilê te heliya?
Got:-Qasî min, temenê min, tereziya min...



* * *

Mişk aşa da dibe,
Aşa da mezin dibe,
Aşa da disekite,
Lê nabe aşvan.

* * *



Çûkê, çûkê,
Pir biçûkê
Çîvanokê,
Xapxapokê,
Dengê çûkê
Çû gêdokê

* * *

Pişo, pişo nêrgizo,
Ha ser ava dengizo,
Ne gur dixwe, ne dizo.

Mirîşkê pirsî:
-Sibê roj çima
derdikeve?
Dîk got:
-Dixwaze guh bide
dengê min.







* * *



Çêjka qirikê gote diya xwe:
-Eger em danin erdê, wê mirovek bê, emê çawa zanibin, wê kevira bavêje me?
-Eger ew biçive erdê, ewê kevir hilde.
-Dayê, eger kevir di berîka wî dabe?
-Ê, tu ji min aqiltirî, tu çi pirsa ji min dikî?

# DU NÊRÎ


Ser çemekê çawa pira kêranekî kêmber danîbûn. Carekê du nêriyê serhişk li ser wê pirê rastî hev hatin.

Herdu nêrî nikaribûn ber hevdura derbaz bibûna. Gotî yek ji wana şûnda vekişiya, wekî rê bida yê dinê.

Yekê got:

-Tu şûnda vegere, wekî ez pêşiyê biçim.

Yê dinê got:



-Lê tu çima venagerî û ji minra dibêjî.

-Ez ji tera dibêjim şûnda vekişe, ez berê hilkişyame ser pirê.

-Bibaxşîne. Tu zanî bi kêra xeber didî? Çi hêrs dibî?

Herdu nêrî bi struya hatine hev, li hev dan û herdu jî li ser pirê şimitîn, ketin nava avê.



*Pirs:*

1 Nêriya çima şer kir?
2. Kîjan binket?
3. Şerê wan çawa bi dawî bû?

# AMORÊN KAR




Evan nava di bîra xwe da xweyîkin, çend nava di lênûsa xwe da binivîsin.

# AMORÊN KAR

Mer
Tevir
Dirgan
sêtilî
Çartilî
bêr
Gêzî
Birek

Traktor
tevşo
Kotan
kam
Xerat
cot
nîr
mêkut
conî
destar
mivred
das
Çakûç


Avdang
Bişkok
Koç
Derzî
pênûs



## Şîret

*Pêşek çêke,*
*Paşla xweke,*
*Beriya xweke,*
*Hewcê te tê,*
*Derî veke...*

# ÇI XWEDIKIN Û PÊDIKIN





Kincê mêra
Telik
Şal
Kiras
Pot
Gore
Koloz
Kum
Kumê havînê
Kumê guhik

Kincê jina
Dêre
Xelat
Lepik
Dêrê kin
Dêrê dirêj
Navdêre
Şalik
Kofî
Şer
Şimaqî
Êlek
Destmal
Şimik
Solê havînê
Solê zivistanê





*Spartin:*

1. Evan nava hînbin.
2. Çend nava lênûsa xwe da binivîsin.

# Qîqanê

Qîqanê, ha qîqanê,
Agirê reşî denê,
Avîte gola hanê,
Gola hanê qamîşe,
Marek têda fîşe-fîşe,
Navê kekêm Çawîşe,
Çawîşekî biçûke,
Jêra anîne bûke,
Bûka me qelendere,
Xweya şara zere,
Şara zer qet kir,
Heft qotik mircan kir,
Heta bendê fêzê,
Qantir kişiyan rêzê,
Serî çû Tevrêzê,
Poçik ma bal Kêzê.



*Spartin:*
Jiber bikin




## zûgotinok

ji zargotina gel


# PARÊN GEWDÊ MERIVA

Çev, bijang, birû, herdu çav, poz, guh, lêv, diran, gulî
Dest, mil, tilî, girka mil, enîşk, ling, penî, pozik serpoçik, qarçik serpo gûzek, çok, hê.

Lêv, poz, bêvil enî, guh, cênîk, lêv, dev û diran, ziman, diran, stukur, sersîng, zik,pişta pîl, piçeng, garçik, mezmezîk, sêvik,





Evan nava hînbin, lênûsa xwe da binivîsin.




Evan nava hînbin

# RENG




Evan navên renga jiber hînbin:

# KESKESOR

Pey baranê roj derket û keskesorê xuya kir.
Keskesorê gote rojê:
-Hela li min binêre, ez ji te bedewtirim. Hela binêre çend rengê min hene: şîn, sor, kesk, zer, sût, hêşîn...
Rojê gotê:
-Lê tu wê yekê zanî, wekî min ew reng dane te.
Keskesorê got:
-Te?.. Ew yek derewe.
-Derewe, erê, -rojê got û kete nava ewra.
Gava ku roj kete nava ewra, keskesor jî pêra winda bû.





## *Pirs û spartin:*

1. Pey baranêra çi derket?
2. Keskesorê rojê ra çi got?
3. Rojê çi gote keskesorê?
4. Hevrika wana çawa bi dawî bû ?




Îsal payîza hezar awazî
Dibên, bi gune kurdekê haitye,
Ser şirîta xwe, şeveke sayî
Ewê laçka xwe şûştî raxistye,
Bayê ji dizîva qetandiye, biriye
Û seranser deşta raxistye...

Îsal payîza hezar awazî
Dibên, bi qesta kurdekê hatiye.

*Evê helbestê jiber hînbin:*





# BARAN

Hûrik-hûrik wa dibarî,
Ezmanê jor têyî xwarê,
Avê didî çem û kanî,
Gul-sosinên vê biharê.
Hey baranê kaniya jînê,
Tu hemyara tînî karê,
Bo çi caran dikî kînê,
Bi hêrs ezman têyî xwarê.
Eva êdî çend-çend caran
Dikî lêyî ser cihanê
Ber xwe dibî gund-bajaran,
Çê dikî qezî mirinê.
Kî neyarî şîret da te
Dikî kîn û xiyanetê?
Ne aferim, xîreta te,
Dînik, keça vê tebiyetê.

*Spartin:*
Jiber bikin

# DEMÊN ROJÊ



Berîberbang
Berbang
Şebeq
Sibê zû
Nîvro
Berêvar
Êvar
Şev



## *Spartin:*



Evan nava jiber hînbin, di lênûsa xweda binivîsin:

# ROJ Û HÎV

Rokê hîvê gote rojê:
-Rojê, tu xûşka minî, gelo nabe, wekî tu destek kinc ji minra bidrûyî.
Rojê gotê:
-Ezê çawa ji tera bidrûm, wekî tu ser çapekê nasekinî?



## *Pirs û spartin:*

1. Hîvê çi gote rojê?
2. Rojê çima ji hîvêra kinc nedirût?

# SAL Û DONZDEH MEHÊN WÊ

Çar heyaman jî demsalên salê hene: ZIVISTAN, BIHAR, HAVÎN, PAYÎZ.
Her ji sê mehane.
Sê mehê zivistanê evin: KANÛNA PÊŞÎN ÇILE,, SIBAT.

Mehên biharê: ADAR, NÎSAN, GULAN.

Mehên havînê: HEZÎRAN, TÎRMEH, TEBAX.

Mehên payîzê: ÎLON, COTMEH, MIJDAR



## *Pirs û sipartin:*

1. Çend demsalên salê hene?
2. Her rozgarek jii çend mehane?
3. Navê donzdeh mehên salê hînbin û bêjin.
4. Bi gotinên zivistan, bihar, havîn, payîz hevokan çêkin.
5. Donzdeh hevokên wisa çêkin, ku navê her mehekê têda hebe.

# ÇAR BIRA



Çar birane, çar bira,
Her kes wana rind zane.

Bihar ji xewê radibe,
Xwe geş dike, şa dibe.

Havîn xûdan li ser rû
Her roj ji zeviyê zêr didrû.

Payîz di bin barê êmîş
Ji xwera dike seyramîş.

Zivistan hat, axa reş
Li xwekir kurkê çîl-qerqaş.


Çar birane, çar bira,
Tên û diçin pey hevra...



## *Pirs û spartin:*

1. Çar bra kîne?
2. Demsala biharê çawan e?
3. Demsala havînê çawan e?
4. Demsala payîzê çawan e?
5. Demsala zivistanê çawan e?
6. Navên demsalên salê di lênûsa xwe da binivîsin.

# TÎRÊJÊN ROJÊ



RoJ derket û zer-zeriqand, li her deran şewq veda.

Cara pêşin tîrêjên wê ketin ser hêlîna çivîkê. çivîk hişyar bû, per û baskên xwe li hev dan, ji hêlîna xwe derket, Firî, çû jorê û bi dengekî bilind stra: çiv-çiv, wît-wît.

Tîrêja duduwa avête ser kêvroşkê. Kêvroşkê guhê xwe bel kirin, li vî alî û wî alî nihêrî, çing da, çû kete nava gul û giya, dest bi taştiya xwe kir.

Tîrêja sisiya kete ser mrîşka. Dîk per û baskên xwe li hevdu dan û bang da: qî-qî-qlî-qî, qî-qi-qlî-qî! Dîk gazî mrîşka kir, wekî ji tarê peya bin, bên û taştiya sibê bixwin.



Mrîşk firîn jêrê, kirin kirte-kirt û ser glîê dîk dest bi taştê kirin.

Tîrêja çara da ser mozê hingiv. Moz germ bûn, ji pêtekê hingiv derketin, kirne vinge-ving û firîn, çûn vî alî û wî alî, wekî ji ser kulîlkê reng-rengî xarna xwe berhev bikin.

Tîrêja pênca avête ser cî-nvînê kurekî jîr û çavê wî xwerand. Hişyar kir.

Ewî jii cihê xwe banzda erdê û bi lez amade bû, wekî here Dibistanê.



## *Pirs û spartin:*

1.Rojê çi kir?
2. Rojê tîrêjên xwe yê pêşin avête kîderê?
3. Terevila çigotin?
4. Evê serhatiyê bi nava bixwînin û şîrovekin
5. Çend rêza di lênûsa xwe da binivîsin.

# KÎ ZORE

Carekê berf, baran û ba bi hevra ketin hevrikê, ka kî ji wana zore.

Baranê got:

-Ez ji gişka zortirim. Li herdera dibarim. Kesek bi min nikare.

Bayê got:

-Qet jî na, temenê te kine. Dibarî û zû têyî birînê, zû jî dimiçiqî. Yê zor ezim, wekî çol û çiyara dibezim, xwe digihînim her dera.

Berfê got:

-Temenê te jî kine. Zû têyî birînê, kes tê dernaxe, ka bi kuda çûyî. Yê zor dîsa ezim, dibarim, rûdinim, herdera spî dikim.

Bayê got:

-Lê wekî ez bêm, tuyê ji ber min bi kuda rizgarbî.

-Wey, xwelî li xwe kiro, ezê bikevim  çol û newala, gelî-geboza, xwe veşêrim.

Baranê got:

-Lê wekî ez jî bêm, wî çaxî tuyê çi bikî?

Berfê got:

-Devşilê, kî hay jj te heye. Vaye, tu dibînî, eva bû mîna min û hineka. Çaxê ez dibarim, dibên ,,Ew ji ku hat,,, lê çaxê hiltêm, îca didine kevçî û kodika, pey min dikevin.

Hevrika (hucet) wana wê hê gelekî bikişanda,eger roj derneketa. Rojê tîrêjên zer zeriqand, dinya pêra keniya. Baran, berf û ba êdî her yek di alîkîde winda bûn.



## *Pirs û spartin:*

1. Ew kî bûn bi hevra ketin nava hevrikê?
2. Ji wana kîjan zor bû?
3. Hevrika wana çawa bi dawî bû?
4. Ji vê serhatiyê çend  rêza di lênûsa xwe da binivîsin.

# XWEYÊ RÎS Û DENÇÎ

Mirovek rîsê xwe hiltîne diçe cem dençî, dibêje:
-Vî rîsî ji minra reng bike.
Dençî dibêje:
-Çi rengî dixwazî?
Xweyê rîs dibêje:
-Sor naxwazim, kesk naxwazim, şîn naxwazim, reş naxwazim...
Ew navê çiqa renga hiltîne dibê naxwazim.
Dençî dinêre xweyê rîs reng nehîştin, hemû gotin, ew difikire û dibêje:
-Pak, ezê bikim.
Xweyê rîs dipirse:
Kengê wê amade be ku ez bêm bibim?
Dençî dibêje:
-Duşemê neyê, sêşemê neyê, çarşemê neyê, pêncşemê neyê, înê neyê, şemiyê neyê, yekşemê neyê, wekî dinê çi rojê têyî were.
Xweyê rîs dibîne valaye, rîsê xwe hildide û diçe.






## *Pirs û spartin:*

1. Mirov ji bona çi çû gel dençî?
2. Mirov çi gote dençî?
3. Dençî çi bersiva wî da?
4. Navê renga û roja di lênûsa xwe da cuda-cuda binivîsin:





## DU GUR

Rojeke havînê ya xweş du gur nêzîkî gundekî dibin. Ewana gelekî birçî bûne. Ew çend roj bûn li çiya û baniya digeriyan, lê tu nêçîr rastî wan nedihat. Wextê ewana nêzîkî gundekî dibin, gurek dibêje yê dinê:

-Vaye, nêçîr ji mere peyda bû, were em bigrin têr bixwin.

Gurê dinê ku bala xwe dide golikê, nas dike dibêje:

-Ew golika Kurdo ye. Xweyê wê her roj wê tîne vê mêrga nêzîk ditewilîne hetanî roj diçe ava, têr dike dibe malê. Kurdoyê lawê Mado nêçîrvane, ew dijminê meyî baba nal bab û kalane. Ewî zivistana derbazbûyî mecal li me birîbû, nedihîşt em çevê xwe vekin, nedihîşt tu nêçîr bê ser me, niha dem hatiye, were em tola xwe ji Kurdo hildin.

Gur êriş dikin ser golikê, perçe-perçeyî dikin, têr dixwin, paşê dikevine rê. Pir diçin an hindik, gurek dibêje yê dinê:

-Bira îro pir germe.

Yê dinê dibêje:

- Eva çi germe?


Eger niha xweyê golikê bê ser me,\
Pê se û kuçika bide pey me,\
Vî hevrazî bide ber me,\
Erd ezmanli me têke cehnime,\
A, germ ew germe.



### *Pirs:*

1. Gur li çi digeriyan?
2. Gura ji bo çi golika Kurdo xwarin?

## RÊBIRÊN MERIVA - TRANSPORT




Evan nava bîra xweda xweykin û di lênûsa xwe da binivîsin:

# RÊWIYA HERTIM



Tîrêjên tava biharê avête ser qûça berfê û berfê hêdîka hêsirê avê rêt. Dilopên zelal niqitîn ser rê, tevî dilopên din bûn û bi hevre herikîn berjêr û kirin piste-pist:

-Rê bidin!

Berfîn fikirî û got:

-Ev kiye dike xule-xul?

Serê xwe bilind kir, tava biharê dît û ji şabûnê bîneke xweş jê hat.

Dilop pêşde dilive, rastî dilopên din tê, dipirse:

-Gelî xwişkno, hûn ji kûderê tên?

Dilopên çavkaniyê bersiv didin:

-Ew der teng bû, riya me tarî bû. Dibin axê da me encex hevdu dît û me lezand, em derketine derve, encex me hevdu dît û lezand, em derketine derve. Vira çiqas ronahiye, çiqas aza. Hevalên me zûde rê ketine, me daye pey wana.

Dilopên berfê gazîkirin:

-Em jî bi wera tên!

Ewana tevî dilopên ava kaniyê bûn û bi hevra bûne cû, bû xuşe-xuşa wan, berjêr bûn.

Gupikên çiqên dara hişyarbûn û gotin:

-Ev çi dengin, dibe ku bihare êdî û kurkên xwe êxistin. Cû çû gihîşte cûyeke dinê, bûne çem. Lê çem wek harbûyî bi bayê xwe berjêr kişiya, qûm, belgên hişkbûyî jî bi xwera dibir.

Dilopa me jî tevî hevala dikire xuşe-xuş, bi dengê bilind dikire

gazî:

-Rê bidin!

Çem zûtirê çû gihîşte cûyên mînanî xweye yên dînik. Li hev werimîm, pêlên wan li hev ketin, kef li ser wan ket. Dilopa me li ser dilopeke mezin siyarbûye, çawa direqise, dilîze, şadibe.

Ji nişkêve tê derdixe ku ji pêlên avê veqetiya ye. Tav wê germ dike û gazî cem xwe dike.

Gelekî sivik bilindî jorê dibe, difire ber bi ezmanê şîn, ber bi tava penczêrîn. Difire, nêzîkî xwişkên xwe dibe û bi wan re dibaredike, ji nava ewran dibêje:

-Rê bidin!

Li jorê ewir digihîje ewrekî û ji mirovre wisa tê ku wek ewir li ezmana daleqiyane. Ewrên reşe-tarî bi hevra şer dikin, dikine gure-gur, birûskê davêjin hev. Dilopa me jî xwe davêje vî alî û wî alî, dihejiya, dizivirî, ewr dehf dida û bê sekin dikire qîrîn:

-Rê bidin!

Hemû dibêjin:

-Rê bidin...

Û ji nişkêve bi hevre berjêr dibin, dirijin jêrê, ber bi axê.

Erdê hişkbûyî ji hatina biharê dêmxweş dibe. Dilopa me dikeve nava zeviyekê, li ber koka simbilekê. Simbil rabû û kire gazî:


-Rêwiya hertim, tu bi xêr hatî, min gelek bêriya te dikir.





## *Pirs û spartin:*

1. Dilop çawa û ji çi çêbû?
2. Dilopê çi kir?
4. Dema dilop gihîştine hevdu bûne çi?
5. Dilop dirêde rastî kê hatin û çi kirin?
6. Simbilê çi got dilop ê?




Sînema "Naîrî"




Zanko



Heykelê
Daudê Sasunê



Opera



Der



Sera

# YEKBÛN



Eger xweyîke
Mixek nalekê,
Nal jî hespekê,
Hesp mêrxasekî,
Mêrxas malekê,
Mal jî gundekî,
Gund civakekê
Welat wê çêbe.
Welat ku çêbû,
Bi mixê qayîmke
Hîmê wê malê,
Li ser şêmîkêve
Nalê dardakin,
Situyê hespêve
Temeziya sor
Delal girêdin,
Şûr-qema daynin,
Pencera vekin
Berbi çar qulbê
Hemû cihan ê.



## *Spartin:*

Vê helbestê jiber bikin.

ԽԱԼՏԵ ՋԱԼԻԼ, ԱԼԻԽԱՆԵ ՄԱՄԵ
XALITÊ CELÎL, ELÎXANÊ MEMÊ

Alîyê wezîreta KE xwendine u Zanistîyêda hatîye qebûlkirinê
ՀԱՍՏԱՏՎԱԾ Է ՀՀ ԿՐԹՈՒԹՅԱՆ ԵՎ ԳԻՏՈՒԹՅԱՆ ՆԱԽԱՐԱՐՈՒԹՅԱՆ ԿՈՂՄԻՑ

# ՔՐԴԵՐԵՆ ԱՅԲԲԵՆԱՐԱՆ

# ELÎFBAYA KURDÎ

*Խմբագիր՝ Կարլենե Չաչանի*
RÊDAKTOR - KARLENÊ ÇAÇANÎ
*Շարվածքը և սրբագրությունը՝ Մրազե Ջամալ*
Xebata ser kompyûtêrê û korêktorî kirye MIRAZÊ CEMAL

Չափը՝ 70x100 1/16, տպաքանակը՝ 28 օրինակ
Տպագրվել է «Սպիկա» ՍՊԸ տպարանում

ÇAP - - 70x100 1/16, tiraj- 28

«Սպիկա» հրատարակչություն
Weşanxana «Spika»
2020